

# azadî

KOVARA MARKSÎSTA KURDÎ



*ji azadî û serxivebûnê kirûmettir  
tistik nîn e. ( Ho Chi Minh )*

hejmar 5

sebat 1979

# —ÎRAN: ŞOREŞA XELKÊ

Piştî salekî meş, mitîng, xebatberdan û şerê siyasi gelên Iranê berî Şahê zorkar û mîrkuj dan, yek ji kevintirin monarsiyen cihanê qelibandin. Ne 700.000 leşkerên bi çek û bala firên nûjentirên bi milyar dollaran kiri tec-hizkiri, ne SAVAK'a ku bi mûrtahiya xwe polisê 3 û cihanê dihate hesabkirin, ne 40.000 pispor û "şiretkareñ" emerikanî, ne komandayêن Israilli û Koreyi, ne CIA, ne Carter nikaribûn vê rejîma xwînmij, zordest a pêgirtî û xulamî kî emperyalizmê ji ber lehîya şoresgerî bifi lîtînin. Bi saya yekîti, şerkâri û ezma xwe gelên Iranê serfiraziyeke mezin bidest xistin. Lê şores neqedîyaye! ew bi ketina Şah hê dest-pedike. Roj û heftênu ku têne ewê rûçikekî ronak-tir bidin vê şoreşa teji nenaşî û teji heví.

**F**îlozofên materyalîstên Yew-nanîstana kevn digotin ku "meriv tucar nikare du car xwe di eyî çemî de bişo", av diherike; tişt timî diguherin; di dîrokê de tekrar nîn e. Gava ku tişteki du car biqewime ew cara diduyan we kî bizarîkirieke (teqlîteke) qesmerî ya cara paşîn e, dibêje Marx. Loma dirûvê şoresen dîrokî yên nas nade vê şoreşa Iranê. Yên ku şemayên Şoresan di pîrtûkan de hînbûne bi derbâkî wiñ dabûyî xuya ne; nizanîn çi biponijin li ser Iranê: Pirtûk salî xêwê nadîn! Hin bi çavê tevgere

ke dînî, an bi "vegeraka paşverû-yî" lê dinêrin, qala çarşefkiri-na pîrekan dîkin; di şoreşeka neteweyî ya demokiratîk da şoreşâ sosyalîst dîbînin.

Lê hêzên nîşankirê vê şoreşê diyar in.

A) Hawirêni bi pir nêzikî bi xanedan û rejîma şah ve girêdayî ne tê de, hemî çîn û qorêni ci vaka Iranê, ji karkerêneftê heta bûrjûwayen mezînên liberalên "Cepha Mîlli", ji gundîyan heta memûr û mamostan, ji têcîrêne bazarê heta bîrewer û xwendekaran tevî vê şoreşa ne tenê dijî xa-

**S  
E  
R  
E  
C  
E  
M**

* Tirkîye bi kuda diçe.....	r. 4
* Ji Dîroka Kurdistanê.....	r. 6
* Kardûx û Welatê Kardûxan (2).....	r. 8
* Jinê Kurd li Sovyetistanê (2).....	r. 9
* Yilmaz Güney.....	r. 10
* Yên ku jibo me şerkirin.....	r. 11
* Daxuyanîya Partiya Kommunist.....	r. 12
* Bingehêne Destpêkîyê Felsefê.....	r. 14
* Sazbûna KOMKAR.....	r. 15
* Xebatkarêne Kurd li Fransayê	
* komelekî danîn.....	r. 16
* Biranîna K. Bedirxan; Çarînê Xeyam.....	r. 19
* Zman, Ferhengok.....	r. 20
* Deng û Alan.....	r. 22
* Stran û Leylan.....	r. 23

nedana şah lê wisa jî dijî emperyalîzma amerîkanî û jibo serxwebûna neteweyî bûn.Wisa be ev şoreş şoreşeket neteweyî ye. Armancen wê yên kifşkirî, qelibandina şah, serbest kirina girtîyên siyasî, rakirina SAVAK ê, pêk anîna helbijartinê demokratik, rastkirina azadiya nvîsandin, ba werî û civînê, sazkirina "Komara İslâmî", qewitandina Amerîkanî û Israîlîyan bûn.Evana hemî di dâ hûrînîya (tehlîfa) dawîn da, daxwaz û xwestekê demokratik in.Loma ev şoreş bi xwezaya xwe şoreşeket netexeyîya demokratik e.

## xêliya din

B) Di şertên arizîyên Iranê pêşajoyî ya tevgera şoreşger ke te destê Ayatullah û Melan. Lê ev nîşan nade ku tevger tevgerê dînî ye: em rind dizanin ku Mustafa Kemal ku li ser navê "parastina İslâmîyet û xelîfe" destpêkiribû an ya Şêx Sead ne tevgerê dînî bûn.Dîn jibo pêkâ nîna armancen siyasî -rizgarîya neteweyî- navgîn (wasita) bû, çek bû.Li Irana şaha ku ji sazzkirina partîyen siyasî re tu îmkan qa dida , ya ku bi pişta partîya Tudeh û hêzên pêş verûyên din şkandibû, wan ji xelkê tecrît kiribû, xeynî mizgeftan (camîyan) cîgehekî civînê ne mabû.Xelk dikaribû di bin xêliya dîn de neqaîlî û dijekarîya (mixale feta) xwe nîşan de û bêtirî 40 000 mizgeft ji wan re bûn warêşerî siyasî. Ü dibe

bêgotin ku Xumeynî giyana şoresî gerîya xelkê ji gelek siyaset-baz û bîrewerên bûrjûwa çêtir fam kir; ewî tawîz neda şah û lo ma liber çavê xelkê ku bi keysperest û tirsonekan îtbar nake, mezin bû, dîlxwazên wî rojbiroj zêdetir bûn.Gava ku Sencabî û hevalên wî yên "Cepha Mîllî" ya Mosadeqî -ku hêzeke bûrjûwa ya liberal e- xwastin bi şah re li hevkin Xumeynî netenê qewitandi na şah lê paqijkirina xanedana wî axwast û xelk pê re meşîya.

Di rewşeket şoresgerî de nîv-ted bîr, sistî, dudilî, şermokî nameşin.

C) Mela û Ayatullahê ku hin "şoresgerên tûj" pê tinaza dîkin ji piranîya di wan çêtir giringîya (ehemmîyeta) şerê siyasî û ideolojîk fam kirin, heta dema dawîn xwe nedan şerê çekdarî. Di şerekî de dijminê meriv li kuderê qels be meriv dîba derba xwe li wêderê xe.

Xebata siyasî doza xelkê li ber çavên gelên Iranê û cîhanê, doze ke rast, demokratik, meşrû xuya kir û leşkerên ji nav xelkê derketî jî di nav vî şerê siyasî da pijîyan, hişyar bûn, bi piranîya xwe nexwastin devê çekê xwe bidin singa xelkê.

Du pîrs li ser lêvan in. Çima Ordî diberxwe neda an darbe çê nekir? Çima Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê têkilîyeke eskerî nekirin? Ji van pirsan re di rewşa dane û agahdarîyên ku tênzanîn de bersivê temamî dayîn ne mimkin e.Lê xuya bû ku kerîyeke giranê leşker û serbaz bi dil bi tevgera xelkê re bûn: Xumeynî hê di destpêkê de arîkarî ya wan xwastibû û qewimandin wan nêzî xelkê kirin.General ne ewle (emîn) bûn û ditirsîyan ku darbekî eskerî bibe sedemê şerîn hindurîyên xwînrêj di navbeyna ordîyê de. Ordîya bêdîsîplîn u yekîti qofekî xofdarê vala ye.

## usa cîma têkil nebû ?

Heçî USA, dixuye ku ew jiber du sedemên hîmî têkilîyeke leşkerî nekir.

1° Pişti şîrqama ku Amerîka nî li Vietnamê xwarin, bi awakî eşkere ketina nava şerê hindurî yê welatekî din maceraperestî ye û xelkê amerîkanîyê çavtîrsî yayî, devşewitî tiştekî wilo naxwaze.Loma Yankee jibo karêni wişa hevalbendêñ xwe (Fransa, Mîsir, Brezîlya, heta par Iranâ Shah) seferber dîkin.

Dûmahtîk Rüpel 18e.

# **TİRKİYE Bİ KUDA DİÇE ?**

**B**etağî, bîhayî, deynê derva yêngiran, hilkişana faşîzmê, di salekî de bêtirê 1000 kustinê siyasî: Tîrkîye dikele, Tîrkîye di pêşîrtengîyeke mezin, di boraneka kûr de ye. Ev boran rojbi - roj firedikiş, dikemile, serîdi - gire, şewq û alana xwe dide hemî sazendeyên (mîsesseyê) aborî, siyasî, çandî. Ev boran yek ji kûrtirîn, heye ku kûrtirîn borana kapîtalîzmê ye di dîroka Komara Tîrkîyê.

**S**alekî piştî bi - cîhbûna xwe, hikûmetâ Ecevit, ku pir kesan hêviyên xwe pê ve gi - rîdabûn, hê tu çarekî hîmî (esasî) ne anî - ye, di nav acz û bêka - rînîyê de dipirpite. Berebere ji bêtir ke san re diyar dibe kû pirsên hîmî yêngî civâ - kê bi gotarêñ biri - qok, bi tedbîrêñ ida - rî û qanûnî hel na - bin.

Lê ku ceribandina Ecevit neçe serî ewê çi biqewime? Ewê Tîrkîye bi kuda here? Berbi faşîzmê? Berbi sazbûna **kîkûmetêka** "demokratîka" parlementariya nû? An na hoyêñ (şertêñ) şoreşa sos - lîst gihîstine hev? Li hemberî her yek ji van rewşan di vê şoreşgerêñ Kurd çi bikin? Rîyekî çawa bidin pêşîya gelê Kurd ku ew cardin di geremola dîrokî de neyê fetisandin, ji a - zadîya xwe bêpar ne - mîne?

Dema axaftîna va

pirsên stratejîyê ha - tîye. Em di çarceva kovara xwe de li ser hin ji van pirsan dî tinêñ xwe tînin û hê vîdar in ku hemî ha - wirêñ şoreşgerêñ Kurd, yêngî ku di hin waran de bawerîyêñ me parî nakin jî tê de, bi sergiranî û berpirsîyarî li ser van pirsan biponijin û rûpelên xwe ji wan re vekirî dihêlin.

## **Borana Kapîtalîzmê**

**D**i salêñ 70 de sîstema kapîtalîst a cîhanî bi tevayî ya xwe ketîye nav boranekî (krîzekî) kûr ku, dijaneyî peyivan - dinêñ tejîhêvîyêñ karbidestêñ Amerîka - nî an Ewrûpayî, hê dom dike, pêşve diçê û wekî ku tê gotin 'dawîya tinelê ne xu - ya ye'. Bi kurtî sede - mén vê boranê: şêlan - din û talana wela -

têñ paşdamayî, karêñ bilindêñ bûrjûwazîyê sermayeyêñ zehf gi - ran gihadine hev di destêñ sermayedarêñ dewletêñ kapîtalîs - têñ pêşveçûyî. Serma - ye nikare di cîhê xwe de, di banqa û qa - san de razê. Serma - ya ku kar nake, ku ka - rê nayne, wekî berfa - ber tavê dihele, ji rûmeta xwe winda di - ke. Loma sermayedar mecbûr in ku hilberî niya (îstîhsala) xwê ya sanayîî berebere zêdetir bikin, fabrî - qên nû vekin, ji yêngî kevn da bêtir mal - derxin, bêtir bifro - şin. Heke hewcedarî - yêñ hîmîyêñ civakêñ wan (xwarin, vexwarin cil, xanî, rê, nexwes - xane, xwendegeh, hwd.) tatmîn bûbin hin hew - cedarîyêñ nû, sûn'î bidin peyda kirin ku dikaribin bêtir bifro - şin, bêtir karbi - kin. Lê ev reva bere - pêş nikare heta hêda wînahîyê dom bike, ew di cîh kî de asê dibe. Karîn û t qeta xelkê dest na de ku ew çen dî firotîşkan biki - rin. Dimîne firotina wan a welatêñ paşda - mayî. Hewcedarîyêñ wan pir in, bêhesab in lê îmkanêñ wan ên kirînê kêm in; lew ra firehkirina vê ba - zara han dijwar e. Sîstem dikeve pêşîrtengîyeke ku bi gîlî yêñ marksîst meriv dikare awa deyne: Pey

wendîyêñ hilberînîyê (îsfîhsalê) hêzên hilberînîyê dizîncîrînin, difetisînin, dibin manîê pêşveçûna wan. Ev borana zêde hilberînîyê ye.

Di nav bagerêñ boranê de şerê navbeyna dewletêñ kapîtalîst jibo destdanîna li ser bazarêñ cîhanê xurttir û gurtir dibe; hemberîtî ya tîcarî dikeve rengê "şerî sar", her dewlektî kapîtalîst dixwaze bi kêmter zerar xwe ji vî "agirê" bi filitîne, her yek kêr hatînîyê xwe bi hemî awayan, "derbêñ qirêj" jî tê de, dipareze. Dewletêñ Yekbûyî yêñ Amrikayê di salekî de rûmeta dollar 20% dixînin liber. Yen a Japonî -hemberê wanê Yekemîn-û liber markê almanî da ko mal û firotîşkêñ wan li derva erzantir bin, ji yêñ hemberê wan bêtir bêñ firotin. Karbidestêñ kapîtalîstêñ giregir,

serekdewlet civîn li ser civîn çêdikin ji bo hinekî ahenk û qâide têxin nav vî "şerî tîcarî", bazaran bi awakî "adîltir" li hev parîbikin, ku yêñ girtir timî lihêfê berbixwe neşînin.

Bi deh milyar dolalaran sermayeyê "betal û aware", yêñ ku imkana kara sanayî nabînin di navbeyna Wall Street'a amerîkanî û serbajarêñ malhebûnîyê Ewrûpayê de bi hêvîya karêñ spekulasyonê diçin û têñ, bi rûmeta diravan dileyizin; geh mark geh frankê swissî dikirin bi hêvîya ku ewê rûmetê wan zêde bibe û ewê têde "li partîyê xin", karekî mezin bikin. Ev leyistin sîstema diravî (pereyî) ya kapîtalîst ji rê derdi xe, diteribîne, danûstanêñ navbeyna wela têñ kapîtalîst dixe nava bêpergakîyê û boranê hê kûrtir dike.

her dewlet dixwaze berê agir ji xwe dûr bike.

(dûmahik heye)

## Demokrasiya

## Ecevit

Di hemî gotarêñ xwe de Ecevit bi serê demokrastyê sondixwe, dersêñ demokrastyê dide. Me dizanibû ku ev demokrastyâ "sosyal" dergehêñ xwe ji bêtirf 10 milyon Kurdêñ Tirkîyê re girtt dihêle, tmka nê xebata styast na-de wan. Niha jî em hîn dîbin ku jibo pêşt li hilkaşana faştamê bigirin awayê "çêtir" girtina komele û kovarêñ qep e!.

Piştî kuştin û qirkirinêñ hovêñ Marşê, berpirastyaren kîjana hê nehatine girtin, di kanûna dwîn Ecevit di 13 bajaran de tîdara orftulan kir û bi vî awayî sert liber daxwaza hêzên rast û mîlt tarfst tewand. Di şuna girtina Partîya Faşîsta Turkes, komik û çeteyêñ wan ên çek dard bipeliştne du komeleyêñ xwendekarêñ Kurd (DDKDûDHKD) kovarêñ pêşverû (Rizgarî, Roja Welat, Devrimci Demokratik Gençlik Dergisi, DevGenç, hwd) girt. Lî, ne weka dema Erim bi derbekt û li hemî çayan. Bi nermt, bajêr piştî bajêr, zûl bi zûl, di bêdengîtyê de. Cihêbûna nava "demokrastyâ xurt" û sosyal demokrast gelotenê pirsa awa û takîka ye.


## Deh milyon û nîv betal

Nîşana dervayî ya berbiçavtir a boranê (krîzê) betalî ye. Li gora daneyêñ resmî di dawîya sala 1978 an de di pênc ji xurtîn dewletêñ kapîtalîst de, li Dewletêñ Yekbûyî (USA), Kanada, Ingîlttere, Koma-ra Federala Elmanyê û Fransa, deh milyon û nîv betal hebûn. Ü betalî rojbiroj zêde tir dibe. Jibo kêmkirina hejmaran beta-lan û pêşîgirtina te-qandinêñ civakî ku betalî dikare bide zayîn, welatêñ kapîta-

lîst karkerêñ biyanî (ecnebî), yêñ ku bî salan ji wan re wekî kolan xebitîn, diqewî tînin, berî wan didîn Tenê Elmania Rojava, sala çûyî milyon û sêsed hezar karkerêñ Tîrk, Yûgoslav û Italî-derxistin. Fransa derîyêñ xwe ji karke-rêñ biyahî re digirê û yêñ ku lê bicîhbûne jî dertîne. Di moraz û bagerê de her kes di etirîya canê xwe da ye, kes li cîranê xwe nabe xweyî. Di vê bihura tenga kapîtalîzmê de jî

# Jİ DİROKA

## -IV-



**N**sûr bi perçiqandin û şelan dina gelên Rohelata Nêzîk dewlemendiyên mezin dahû hev. Ey hemî wekî xenîmet ketin destên Medan. Liser vê serketina Meda dîroknasê fransîzî berbiçav R. Ghirshman dibêje; "Cara pêşîn di dîroka gelên vê perçeyê cîhanê de, hilmekî nû dixuve di van serfirazîyên Medan de: Ew xelkê binketi (maxlûb) qir nakin, wî mecbûr nakin ku dev ji zevî û malên xwe berde, wî naxînin şûna koleyan. Hovîti îcar ne hî serfirazîyê re bû."

### zevta asya piçûk

Ev serfirazi di sala 605 an de rûpela xwe ya dawîn dinivîse, cîgeha dawîna berxwedana a-sûri Herranê jî distîne. Piştî ketina Asûrê Kîaksar dest hî zevta Asya piçûk dike û leske-rêñ wî heta tixîhê dewleta Lîd yayê dimeşin. Şerê navbeyna her du dewleta jiho serweriya Asya piçûk heta 28 ê gulanê 585 ê


berî d.m. dom dike. Wê rojê jî-nışkeva roj tê girtin û her du alî vê yekê weka nîşana aşîtiyê dibînin, şer didin rawestin. Bajare Halis li ser Kizil Irma kê dibe tixûhê nava her du dewletan û jibo "têkûzkirina aşîtiyê" Alyatte, qralê Lîdyayê, keça xwe dide Astîai, kurê Kîak-sar. Bi vê aşîtiyê Medya digihê bandeva (zîrwa) meznahîya xwe û dibe vek ji mezintirêñ împaratoriyyê cîhanê. Qasî sedsal-e-kî erdêñ wê ji Asya niçûk dikîşin heta Asya Navîn.

**B**i awê ku dîrokñvis dibêjin Astîai kesekî şikdar hû û nedixwast karînê (îqtîdarê) parî hike. Lewra nava wî û xanezayêñ (begzadeyêñ) Medan vebûbû ji her ku heryek ji vana jî dixwastin di tengâ xwe de hikim bikin, di karê dewletê de bibin xwedî gotin; Karin bihe vê hemî xanezahîyê (zadeganîyê) ne tenê ya kesekî. Serekê van xaneza

# KURDISTANÊ



**K**alana zêrîn ji gencîneya Oksûs, sedsalên VII-VI bê rt dema me. Li jêr didemekî ji nêçtra bi rim û kevan. Brîtish Museum, London



yêñ ji imparotor nerazi Harpagûz bû. Hingê, Kûras (Kîrûs) II, kurê Kamhîz (mîrekê Farisa) û Mandan, keça Astfaj xwast ji van berberî û duhendîyan istifade bike û kalê xwe Astfaj ji text bixîne. Şerê navheyna faris û Medan sê sal dom kir.

## ketina împaratoriye

Harpagûz û hin xanezayêñ Med teví hêzêñ xwe gîhîştin Kûras II ê faris. Leşkerê Med bindest ket û Astfaj bixwe ji dîl hate girtin. Kûras Ekbatanê stend û talan kir û xwe "qralê Medan" ilan kir, Harpagûz kir serdarê leşkerê xwe. Lê xanezayêñ Medêñ din ji karînê bêpar man jiber ku Kûras dewletê kir destê beg, mîrek û serdarêñ faris. Harpagûz ewê liser hesabê Kûras Lîdyayê zevt ke û bibe satrapê wê.

Med serxwebûna xwe windaki-ribûn lê hê hêviya wana rizgariyê hebû. Gellek caran li dijî Farisan serî hildan lê hiserne ketin. Dewleta Medan dewleta Kurdaya mezina pêşîn bû; çend

sedsal piştî ketina wan ji hê Iran bi navê wan dihate naskîrin. (Dumahik heye)



gîlî	1979	azadî
1	2	3
4	5	6
7	8	9
10	11	12
13	14	15
16	17	18
19	20	21
22	23	24
25	26	27
28	29	30
31		

Roznama AZADÎ 1979  
13 Rûpel, 30x40, 10dm.

# Ji Dîroka Kurdistanê

## KARDÜX Û WELRATÊ

### KARDÜXAN

AN KURD Û KURDISTAN DI WEXTÊ YEWNANISTANA KEVIN DE

**Y**ek ji kevintirîn nvîsar li ser pêşîyên Kurdan "Anabasîs an Parkeşana deh hezaran" e. Fermandarê Yewnanîstana kevin Ksênefon wê nvîsandîye û tê de qala şerê ku bi Kardûxan re kirine dike. Nvîsara Ksênefon cara pêşîn di kovara HAWAR û hejmara 32 a, sala 1941 an bi kurdîya Herekol Azîzan derketîye. Hunê li jêrê dûmahika hejmara IV a bixwînin.

**P**iştî nîvro dijmin ji nişkekê ve daket deştê û li me der bû. Kardûxan yewnanê ko ji ordîwê dûr keti bûn û dabûn pêy talêñ kuştin. Li hirê me gelek pez, ji pezêñ ko şivanan dikir ji avê derbas bîkin, standin.

Ecaman gava dît ko em zadê xwe ji gundan dibin, rabûn a gir berdan gundan. Ksênefon digot em herin arîkarîya gundiyan û nehêlin ko gunûn wan bişewitînin.

Lê Xerîsof ne di vê fikrê de bû. Yewnan gotina Xerîsof di ser gotina Ksênefon re girtin û wan jî dest bi şewitandi na gundêñ **Kardûxan** kir.

Lê ji ber ko yewnanan nikari bû di Dîclê re derbas bîbin berê xwe dan ciyayêñ welatêñ Kardûxan.

Kardûx, gava bi me hesiyan; ji gundêñ xwe rabûn û zarowêñ xwe berê xwe dan ciyan.

Dî gundêñ kardûxan de me gelek zadû zexîre dîtin. Xanîyêñ kardûxan bi kiloz û dîzikêñ tinc û sifir xemilandî bûn. Yewnanan dest ne dane wan, û ne ketin pey kardûxen ko direvin. Ji ber ko me di dilê xwe de digot heke me bi wan xweskir, heye ko em ji welañ wan bê teq û req û bi awakî dostañe derbas bibin. Ji xwe Kardûx bi xwe neyarê şahê Ecem bûn.

Lê yewnanan herçîzad û zexîre ne, tevde dibirin; ji ber bêgavîyê.

Kardûxan guh ne da xweskirina yewnanan û tu rûyê dostî û aşîyê şanî wan nedan.

Dimdar heta bi tarîyê di cihê xwe de ma û bi şev dakete gundan. Ji ber ko rê gelek teng bû, bi hewa ketin û dahatin rojekê ajoti bû.

Hinek ji kardûxan giha bûn hev û ajoti bûn ser yewnanêñ ko ji par re ma bûn.

(Dûmahik heye)

Tevdîra me ev bû ko em ji ker ve ji deştê rabin û berîya dijmin xwe bigêhînin bilindcîhan. Ji xwe ji şevê kotekî ew ze man ma bû ko em bêî bêne dîtin ji deştê derbas bibin. Me emrî barkirinê da û bi spêdê ve em gihane ciyê.

Xrîsof digel firqe û segmanêñ xwe ên sivik ketibû pêşîyê. Ksênefon di dimdarê de ma bû û pê re tu segmanêñ sivik nîn bûn. Eskerên wî tev de piyadeyêñ giran bûn. Ji ber ko yewnanan mihtemel ne didît ko ecem bidin ciyê, ji par re li wan vegerin, bidin pey û li wan xin.

Xrîsof, berîya ko Kardûx pê bihesin, digel eskerê xwe giha bû pehnava ciyê. Ordîwê dida pêy. Bi vî awayî em gihane gunden ko di newal û di gêran de bûn.

## JİNÊN KURD Lİ SOVYETİSTANË



NAZÎ ŞIRAY

**E**vê xebata partîyayê û hikûme tê zûtirekê berê xweyî baş da. Îndî sala 1929 a 17 jinêd Kurd çawaşandîyên (dêpûtatên) şêwra gund hatinê bijartinê. Lê Sûsika Xudo bû sereka şêwra gundê Karwanserayê. Jina Kurd bi serekîtiya şêwra gundî va îndî destanîneke qeydê Sovyetîvê bû.

Sûsika Xudo ji dika(tribûnal) civîna Şewra Ermenîstanêye VI.a,

delegayá kijanê ew hatibû bijartinê, di bin çepikên hazira da, laçika serê xwe wêda avêt û got: "Ez îroda vê laçikê davêjim çawa nîşana paşmayintiya sed sala, ya ku bîr û baweriyêd min bend dikir." Jinêd Kurd ketine derge-dîwana, xebatkara ew çawa wekîlê xwe dibijartin. Awa, sala 1938, çelekdoşa gundê Cercerîsê (navça Elegê zê) Stoya Şawo çawa dêpûtata (endama Parlementê) Şewra Ermenîstanêye Bilintirîn té bijartinê. Li civîna Şewra Ermenîstanêye VIIIa Goga Cango, ji gundê Kurdayê Gelto derheqa wê yekê da xeberdide, wekî çawa hîn kirine û çawa nava Kurda da nexwendewarî té hildanê.

Jina Kurd Naza şîrayî eva îdî sê salî zêdetir e, wekî ser dikêd sîrkîn Yekîtiya Sovyetî û welatê cîhanêye mayîn, cilê Kurdayê ren gareng lixwekirî temaşevana heweshîmetkar dihêle. Artîsta Komara Yekîtiya Sovyetiyê ya emekdar ji Erivanê hetanî Berlinê û Parîsê, ji Leningradê heyâ Amerikayê nas dîkin.

Dota kurd timî ji sazbendî hizkirîye li şahiya û bindarûka stiraye. Lê tenê sazûmana Sovyetî mecal davê wekî stranêni Kurdî derxe ser sahnê, nîşanî bihezaran temaşevanê milletên cihê-cihê bike. Dengbêja Kurda hêja Sûsika Simo li ser sahnêni gelek bajaran stranêni Kurdî stirîye. Gelek Kula mîn wê li fonda (kewara) Radyoya Erîvanê ya Kurdi da têne xweyîrinê. Gelek caran konsertên wê bi bidûrdîtinokê (televîzyonê) nîşan kirine. Maşoqa sazbendiyê ya rast temamiya hinerê xwe pêşkêşî propaganda kirina sazbendiya gelê xwe kir. Divê bê gotinê, wekî koma Kurda ya kulam-reqsê, ku ewê serokatî lê dikir, gîhîste deraca dewletiyê (professionelî).

(dûmahîk heye)

TÊMÛRÊ XELİL \* \* TOSINÊ REŞİT

# HEZAR KULÎLK\*HEZAR STÊRK

Şoreşger û  
Fîlimçêkerê  
navdar:

## YILMAZ GÜNEY

Y.Güney bi fîlim-  
çêkerê Emerîka-  
nî Elia Kazan re.  
(ji New York Times)



Di van bîst salêñ dawîn de ji Tîr kîyê navê kêm kesan di warê pîşe û wêje de li derva hatiye bihfîtin. Navdari- rên wan nvîskar û romannvîs Yaşar Kemal û fîlimçêkerê şo- reşger Yilmaz Güney in. Ew di cîhkî de dîghîjin hev: Her du jî Kurd in û bandûra (îlhama) xwe jî jiyana gelê Kurd, ji rewşa civakîya Kur- dan distînin.

Lê ev dirûvdanî li vir dimîne. Gava ku Yaşar Kemal, romanên kîjanî hatine verge randinê bêtirê bîst zmanêñ biyanî, tenê bi nvîsandinê bilî dibe, "têkîlî siyase tê" nabe û doza Kur dîtiyê nake, Yilmaz Güney filmên xwe weka çekekî (silahê kî) jibo şîyarbûnâ karker û gundiyan, jibo pêşveçûna tev- gerâ şoreşgerî bi- kartîne, **bîmîtxasî** şer dike, doza mafêñ Kurdan dike.

Yilmaz li navçeya Siwêrekê di malekî mitewazî de hatîye dinê. Gava jibo xwen dina bilind çûbû Stenbolê jibo dikaribe zikê xwe têrke di filman de wekî "figûran" dileyîst. Di vê navê de xur- tahiya tesîra fil- man li ser xelkê ba- la wî kişand. Ewî xwast fîlma ku heta hingê xewnêñ xapîno kên tewş difrotîn belengaz û pérçiqî- yan têxe çekekî (sî lahekî) hisyarbûna wan. Filmên wî yêñ wekî "Umût" (Hêvî), Seyit Han, Arkadaş (Heval), bi xurtahî- ya xwe ya pîşekarî, zîzahî (lîrikî) û sî yasî ne tenê li Tîr kîyê lê li welatêñ Ewrûpayê jî pesn û teqdîrekî mezin dî- tin. Hikûmeta Tirkî pêlekî wan fîlma "U- mut" qedexe kir. Yîl- maz liber çavê xel- kê bûbû "mêrxas û Parazkarê bêkesan".

Karbîdestêñ Tirk, wî di sala 1971 an

de avêtin zîndanê û ewî jibo arîkarîya ku dabû hêzên şores ger mehkûm kirin. Di havîna 1974 an, gava Bexşandina Giştî dertê, Yilmaz ji gir tîgehê dertê û pêre dest bi çêkirina fîlmekî nû dike. Aza dîya wî bizor çend hefte dom kir: şeve- kî di xwaringehekî de hakimekî faşîstê serxweş liber çavêñ xelkê çêrî wî û ji- na wî dike, lê heqa- retêñ mezin dike. Da- wiya çîrokê tê za- nîn: Çend gulle û ha- kimê faşîst tê kuş- tin. Karbîdestêñ An- karayê jî li tişte- kî wilo digerin. Yîl- maz Güney ji nûve digirin û 21 sal ce- za didinê. İro ew di zîndana Toptaşiyê, li Stenbolê girtîye. İro ji hemî hawirêñ pîşekarêñ cîhanê, deng radibin û teví demokrat û şoreşge- rên Tirkîyê, azadîya Yilmaz Güney dixwa- zin.

AZADÎ JIBO

YILMAZ GÜNEY!

# Yêñ Kû Jîbo Me Ser Kirin

## ROGER LESCOT

Di van rojêñ tarîtirêñ jiyana xelkê me hin kes li wela-têñ derva li me xwe-yî derketine, xwasti-ne dengê me bidin bi-hîstin, rewşa me bi-din naskirin, hejmara dost û dilxwazêñ me zêdetir bikin, xelkêñ cîhanê ji hebûna me haydar û agah bikin.

Roger Lescot yek ji van doston bû; ewî di warê dannaskirina çanda kurdî li derva bi wergerandinê xwe yêñ sipehî xebatekî giranbiha pêk anî. Di sala 1936 an de, gava ku ew xwendina xwe ya wêjeya (edebîya - ta) fransizî û zanis-tîyêñ siyasî tevî xwendegeha zmanêñ ro-helatî ya Zanîngeha Parîsê xelas dike, hi-kûmeta fransiz wî ji-bo pêkanîna lêgerînî yêñ zanistî (ilmî) di-sîne Enstîtuya Fransiza Şamê. Hingê Roger hê teze 22 salî ye û ew, xeynî zmanêñ ewrûpayî, qenc erebî, farisî û tirkî dizane. Li Şamê ew rastî Celadet Bedirxan dib-e, kîjanî di wan salan de kovara "Hawar-rê" derdixist. Û pêre dostaniyeke mezin destpêdike.

Roger giraniya xebata xwe ya zanistî dide ser Kurdan, Kurdî hîndibe, çîrok, metelok û efsaneyên kurdî berev dike ji-bo çapê, li ser jiyan-a civakîya Kurdan, li ser ola Yêzîdîya lêgerînîyan pêktîne.



Kerîyek ji vê xebata destpêkî di kovara "Hawar" ê de di binavê "Tawûsparêz" bi kurdî û fransizî derdikeve.

### Lezgîn Axa

Roger Lescot di nav Kurden Sûriyê de ew qas dihate naskirinê û hizkirinê ku kesî bi navê wî yê fransizî gazî nedikir, navekî kurdî lê kiribûn. Ew Lezgîn Axa bû.

Di sala 1938 an de pirtûka wî ya pêşîn a li ser Kurda dertê. Ew li ser Yêzî dîyêñ Sûriyê û Sincarê ye. Dû re "Textes Kurdes" (Nîsarêñ Kurdî) li Parîsê bi zmanê kurdî û wergerandinâ fransizî çap di bin. Cildê pêşîn (257 rûpel) de çîrok, mete lok û têderxistino-kîn kurdî hene. Cildê 2 a (383+XXV rûpel) Mamê Alan e. Kurdî ya Mamê Alan ku paşê li Beyrût û niha li Tirkiyê derketine ji pirtûka Lezgîn Axa hatine stendin.

rastî şerê cîhanê yê II a, di kanûna 1945 an de Roger Lescot li Zanîngeha Sorbonne'ê kursiyê zmanê kurdî saz dike û salekî li wir fîrêñ (dersêñ) kurdî dide heta ku Kamûran Bedirxan ji Beyrûtê we-re dewsa wî bigire. Hingê Roger Lescot dikeve wezareta der-vekariya Fransayê û wekî diplomat li çar alîyêñ cîhanê dixebi-te. Lê ew xebata xwe ya zanistîya li ser Kurdan dide domkirin, ji kurdî nvîsan-dinan werdigerîne. Ew di sala 1970 an de li Parîsê li ser rîzmanâ kurdî "Grammaire Kurde" (372r.) ku ewî tevî Celadet Bedirxan çêkiribû çap dike. Ev pirtûk bêguman çêtirîn xeba ta zanistî ye ku he-ta niha li ser zmanê kurdî derketîve. Heçî afîzandinê neşapbû-yî yêñ Lezgîn Axa, di nav wan da berbiçav-tîrîn xebatekî li ser "Eşîrîn Kurdistanê" û "Çend Efsaneyên Kurdî" (Binefşâ Narîn, Siyabendê Silîvî, Der-wîşê Ebdî, hwd) ne.

Roger Lescot, ji İspanyolî û xasme ji farisî (Xeyam, Hafiz, Sadî) ji wergerandinê hêja kiribû. Ew di sala 1962 an de bûbû sefîrê Fransayê pêşî li Ammanê dûre li Bangkokê (Taylanda) Gava ku janeke bêder man Lezgîn Axa di se-bata 1975 an de ji-nava me bir ew hê 61 salî, tejî hêvî û hêza xebatê bû.

# Quncikê Marksizmê

## DAXUYANIYA



KARL MARX (1818-1883)

Bûrjûwazî berebere belabûna navgînên (wasitayê) hilberîniyê, ya xwedanî û ya gelhayê radike. Wê gelhayê gihand hev navgînên hilberîniyê di merkezekî de civand û xwedaniyê xist nava destênejmârekî piçûk. Dawîneya diviyayî ya van guhêrina merkeziyeta siyasî bû. Navçeyen biserêxwe, di nav hev de ew qas bi benê federasyonî girêdayî, xwedîyên kîrha, qanûn, hikûmat, tarifeyen bêşederî (gumruk) ên cihê, di nava neteweyekê xwedîyê eyñi qanûnan, yek kîrha neteweyîya çînî, di pişt beneke bêşederî (1) de komkir.

Bûrjûwazî berebere neslên berê diserhevde da civaka feodal hildi hêtir û xurttir aferand û dida û disrand. Bin nîr xistina hêzên xwezavê, maşînîzm bikaranîna kîmyayê di sanayî û erdçinîyê de, deryavanîya bihilmûgul deryavinîya bihilmûgul xwedanîyê, îndî teqabilî dereca geşbûnîya ku hêzên hilberîniyê gihiştê bûn nedikir. Ew ji hilberîniyê re dibûn aseyî di şûna ku ji erdê hilderketî, kîjan sedsala berê ewê şik bibira ku hêzên hilberîniyê wilo di singê xebata civakî da radizan. (2)

Me dît ku navgînêr hilberînî û danûstanê li ser hîmî kîjana hûrjûwazî avabû, di nav çarçeva civaka feodal da hatinê afirandinê. Di gîtekî nêşveçûna van navgînên hilberînî û danûstanê, peywendîherîniyê ji yê hemî yê di çarçeva kîjana

Hemberîya (reqebeda) serbest tevî qanûna, hîmîya civakî û siyasî ya lêker, tevî serdestî ya aborî û siyasî ya çîna hûrjûwa dewsâ van peywendîyan girt.


Îro em nêvajoyeke dirûvdayî dîbînin.

# PARTİYA KOMMUNİST

Îro em pêvajokî dirûvdayî dibînin. Peywen dîyên bûrjûwayên hilberînî û danûstanê, yêñ xwedîtîyê, civaka bûrjû waya nûjen (modern) kû navgînên (wasitayêñ) hilberînî û danûstanê çendî xurt da zayîn we kî sêrbazê ku nizanê bi hêzên dojehîyê ku ewî bixwe gazî kiribû re serî derkeve. Ev çend dehsalêñ dawîn, dî roka sanayî û bazirganîyê ji dîroka serhila nîna (îsyana) xurtahîyê hilberînîyê li dijî peywendîyê nûjenêñ hilberînîyê, li dijî peywendîyê xwedîtîyê ku hebûn û serdestîya bûrjûwazîyê dihoyînîn, pêve tiştek nîn e. Qala boranêñ (krîzêñ) bazirganîyê ku, bi vegeรen xwe yêñ vedorî (perîyodîk) hingî diçe hebûna civaka bûrjûwa dixin talûkê û digeffînin, kîrin bes e. Ev boran bi awakî rasdîdemî (muntazam) pareke mezina nê tenê yêñ hilberîyêñ (mamûlêñ) çêkirî lê yêñ hêzên hilberînîyêñ afi randî jî xeradikin. Dî nav boran de belaye-kî ku di dewraneka din de ewê tewş û bêmana xuya hûna dikeve pêsi-ra civakê -bela zêde - hilberînîyê. Civak bi derbekî vedigere rewşe ke hovitî ya weşî; tu dibêjî qey xelayîyek,

şerekî qirkirina giştî, hemî îmkanêñ wê yêñ ebûrê birî ne; sanayî û bazirganî hîçbûyî xuya ne. Ü çima?.. Jiber ku civak şehrezayîya zêde îmkanêñ ebûrê yêñ zêde, sanayîya zêde, bazirganîya zêde hene. Hêzên hilberînî yêñ ku di destêñ wê de ne îndî pêşvebirina şehrezayîya bûrjûwa û peywendîyê bûrjûwayê xwedîtîyê hêsan (rehet)nakin; dijane ev hêz jibo van teşeyêñ ku ji pêşvecûna wan re dibin asêyî, pir xurt in; û hema ga va ku hêzên hilberînîyê biser vê asêyîye dikevin ew civaka bûrjûwa seranser dixin nav geremolê û hebûna xwe dîtîya bûrjûwa digefînin. Sîstema bûrjûwa pirr teng bûye jibo ra girtâna dewlemendîyêñ ku ew diafirîne.

**H**ürjûwazî çawa bi ser van boranan dikeve?.. Ji alîkî bi xera kirina girseyî (kîtle-wî)ya hêzên hilberînîyê; ji alîyê din bi fet ha bazarêñ nû û bi jîbinî bikaranîna bazarêñ kevn. Wisa be çawa?.. Bi havilkar (hazir) kirina boranêñ giştîtir û xurttir û bi kêmkirina îmkanêñ pêşigirtina wan.



F. ENGELS (1820-1895)

Çekêñ ku bûrjûwazî jibo xistîna çîna feodal bikaranî îro berî xwe didin bûrjûwazîyê bixwe. (dûmahîk heye)

(1) *Li Ingîlterê bêrt Fransayê pêkhatt, ev pêvajo hê bizore li Alman yayê destpêkiriye. Li wêdér, mtnakt Zollverein, ji sala 1834 a bi virde sazbûye; Mako, hê di 1836 an de, gelhayê erdê wilo tixübkrit ji niha ve 85.6 % Almanya 1871 a, Alsace û Lorraîne ne têda, temstîl dikke.*

(2) *Xebata hevrayît li dijekartya xebata kasan e, û "di rewşeyeye civakt dayî, di hin serîn civaktyen ntvekên (muayenêñ) hilbertnyê û tevt xurtahît û gelengît ya civakt yêñ ntvekên dayî" (Salaire, prix et profit, Paris, Ed. Sociales, 1975, R. 38)*

# BİNGEHËN

## DESTPÊKIRËN

### FELSEEË

#### g. politzer

**M**arksîzm teorîyeke jîndar e û jibo hema nîşandin ew bi ci awayî li pirsan meyze dike, emê mînakekî (mî salekî) ku her kes dinase bistînin:pirsa şerê çînan.

Kelk li ser vê pirsê ci difikirin? Hin diramînin ku parastina nanê wan, wan ji şerê siyasi rizgar dike. Hinê din bawer in ku li kuçê xirecir kirin têr dike; divîyahîya hevdesazbûnê înkâr dikan. Hinê din jî di din pêş ku tenê şerê siyasi ewê ji vê pirsê re helekî bîne.

**J**ibo Marksîst şerê çînan tevahîya:  
 a-Şerekî aborî  
 b-Şerekî siyasi  
 c-Şerekî ideoolojîk e.  
 Wisa be divê ku pirs bi car û demekî li ser van her sê enîyan bê danîn.

a-Meriv nikare tenê jibo nan şer bike bê ku jibo aşitîyê (sulhê) şer ke, bê ku hemî ramânê ku bi kérî şerê jibo van armancan tên biparêze.

b-Ev jibo şerê siyasi jî wisa ye, kîjan ji Marx bivirde bûye zanistîyeke berahî: Divê ku meriv him rewşa aborî û him jî herikanen ideoolojîk têxe nav hesab jibo ajotina şerekî wilo.

c-Heçî şerê ideoolojîk, ku xwe bi propagan dayê dide xuyanê, jibo tesîra wê, divê ku rewşa aborî û siyasi vîxin nav hesabê.

Em dibînin wisa ku hemî ev pirs bi heûdin ve bi nêzikî girê-

dayî ne û ,bi vî awayî li hemberî her rûcikê vê pirsa mezîn a ku şe rî çînan e - mînakî di xebatberdanekî (grevekî) de - bê ku her dane yên pirsê û tevayîya pirsê bi xwe neyne ber çavan.

Wisa be yê ku dikare li ser hemî zemînan şer bike ewê serokatiya çêtir bide tevgerê.

Marksîstekî pirsa şerê çînan awahatê digêhê. Mako, di şerê ideoolojîk ku me divê herroj bajon, em xwe li hemberî pirsên ku safîkiri na wan dijwar e, dibînin:nemirîya gîyanê , hebûna Xwedê, jêzayêñ cîhanê, hwd. Ewê materyalîzma diyalektîk azînê kî (metodekî) hisandînê bide me ku ewê dest bide me van pirsa hemîyan helbike û wisa jî xêliya hemî se seferîn tehrîfa marksîzren

mê, yên ku îddîa temam kirin û nûkirîna wê dikan, hilîne.

#### IV-Seferên Bûrjûwa zîyê li dijî Marksîzmê

**V**an teşebisên xera-kirinê xwe dispêrin hîmén pir cihêreg. Hin dikin nvîskarê sosyalîstên pêş-marksîstî (berî Marx) li ber Marksîzmê rakin. Di vê rîde em pirîcar dibînin ku li dijî Marx "uto-pîstan" bikartînin. Hinê din Proudhon bikartînin; Yê din ji revîzyonîstên berî 1914 an (ku jixwe Lenin bi ostayîyeke mezin pûc kiribû) distînin.

(Dûmahik heye)

Utopîst ji sosyalîstên bert dantna sosyalîzma zanistîya Marx û Engels re tê gotin. Navdartirêن wan Gracchus Babeuf (1760-1797), Saint Simon (1760-1825), Charles Fourier (1772-1857), Robert Owen (1771-1858), E; Cabet (1788-1856) ne.

# ◆◆ ENİYA XEBATKARAN ◆◆

## — ELMANYA ROJAVA —



## — SAZBÛNA KOMKAR —

Federasyona Komalên Karke rên Kurdistanê li Elmanya Federal civîna xwe ya sazbûnê federasyonê roja 13. 1. 1979 de li bajarê Frankfurtê di salonekî mezin de çêkir. Di vê civîna gi rîng de, xeynî civînvanan.. ji Fransayê, Swêdê, Berlinê hevalên xebatkar û welatparêz hatibûn. Civîn jibo bîranîna şoreşger û kuştîyên Kurdistanê du deqe di selamê de ma û piştre dest bi xwendina mesaj û têlegraman kîrin.

Destûra Federasyonê hate xwendin û li ser destûrê hin mineqêşetî hetin kîrin û paşê ew bi tevayîya dengen hate qebûl kîrin:

Piştî qebûlkirina destûrê axaftin çêbûn liser rewşa kar kerên Kurdistanê. Civîna sazbûna Federasyona Komeleyên Karke rên Kurdistanê li Elmanya Federal û Berlinê Rojava, bi kurtî KOMKAR, bi şeveka folklorî û mu-

sîkîya rengîn û şen xelas bû; vê şevê de gelek dengbêj sti rrîn û govendger govendê girtin Keç, xort, jin, zarû, û zlamên Kurd bi dilgermîyeke giran he ta yekê sibê şahî kir, Kurdistanê bibîr anîn.

Em bi dilsahîyeke mezin sazbûna KOMKAR ê pîroz dîkin û hêvîdar in ku karkerên Kurdên Danîmarka, Hollanda û Belçîkayê çav bidin xebatkarên Elmanya, Fransa û Swêdê û ji xwe 're komaleyên xwe yê arizî deynin, di şerê rizgarîwazê gelê Kurd de, di şerê jibo Kurdistanâ sosyalîst cîyê xwe bigirin. Em wisa ji hêvîdar in ku pêşverû- yêndî Kurd bi zîhnîyetekê ji sek tarîzmê dûr ber bi tevkarî, bi civandin û berhevkirina hemî bêzên şoreşger û welatparêz bi meşin.

NÜÇEGİHANÊN AZADÎYÊ

# XEBATKAREN KURDÊN

Tevgera karkerêñ Kurdêñ ku li welatêñ Ewrûpaya Rojavayî dixebeitin rojbiroj ji belawê layîyê xelas dibe, dicive, hêzên xwe dide hev û dîkeve ser xêzekî welatparêz û şoreşger. Di vê riya han de gavekî nû û xurt jî sazbûna Yekîti ya Xebatkarêñ Kurdistanê li Fransayê ye.

Hoy û şertêñ Fransa ji yên welatêñ kapitalistêñ din di gellek waran de cihê ne. Bêtirêñ di 3 mîlyon karkerêñ biyanîyêñ ku li Fransê dixebeitin ji mîtingehêñ (mîtem lekêñ) wê yên kevin têñ: Afrîka reş, Ceazayir, Fas, Tûnis. Ên mayî Espanyol û Portekîzîne. Hejmara karkerêñ ku ji Tirkîyê hatine, Kurd û Tirk, dinav hev de li dora çil hezaran e. Çendê di wan Kurd in?.. Ew hê nayê nasîn. Mako ev hejmara piçûk - liber nêzê mil yonekî karkerêñ Tirkî yê ku li Elmanya dixebeitin- jî di zehf bajar û navçeyan de belav bûne: Fabrîqayêñ Peugeot, li Sochaux ; yên Simca û Citroën li dorhêla Parîsê, ya Michelin li Clermont-Ferrand û rêzekî kargeh û fabrîqayêñ piçûkên din, ku her yekî bi sed kîlometran ji hevûdin dûr in. Mînakî yên ku li dorhêla Parîsê bixwe de cîwar-bûne pirîcar ji hev 60-70 km. dûr in.

Di van hoyan da nasaín, hevdesaz û tenzîm kirina karkerêñ Kur-dêñ Fransayê xebatekî

ne wilo hêsan bû. Ev bûn bêtirî du salan ku şoreşgerêñ Kurd li ser vê yekê dixebeitîn, dicadandin.

Bûyerêñ dawînêñ ku li Maraşê qewimîn û talûka qirkirina ku wekî şûrê Damokles li ser serê gelê Kurdê Tirkîyê ye vê tevgerê rezand û roja 27 ê Çile 1979 an karke-rêñ Kurd civîna sazbûna Komela xwe kirin.

Civîn bi peyivandi nêñ li ser rewşa Tirkîyê, ya Kurdistanâ Tirkîyê, ya gelê Kurd li Rojhelata Navîn û li Dînyayê destpêkir. Tê de ji xortêñ ter û tezeyêñ hê nû ji welat ji derdê betalî û birçîbûnê hatî, heta karkerêñ pijîyayî, nav sere, jin û mîr, alewî û sûnnî, Kurdê her navçeyen Kurdistanê hebûn. Dil û çavêñ hemîyan bi daxwaza xizmetekî, xebatekî jibo xelkê Kurdê belengaz û bindest têjî bûn, dîçirisî. Gava ku dilxwazî û dilsozî ev qas xurt in pirs û cihêbûnên Piçûk, ên ku di destpêkê de nayerevîn in, derbasî plana diduyan dibin. Û bi rastî jî wisa bû. Karkerêñ

me bi sergiranî û serwextîyeke mezin bernama (programa) xwe dänîn, armancêñ xwe yên nêzîk û dûr kifş kîrin, xêza xwe ya siyasi bi giştahî dîyar kirin: ji nava xwe komîtekî jibo gerandina xebata rojane helbijartin. Va ye bi kurtî çarçeva xebata Yekîti ya Xebatkarêñ Kurdistanê li Fransa.

## armanc

PIRSÊN XWENDINA ZARO-YÊN KARKERAN : ji des-tê tunebûn û belengazîyê em nexwendî û nezan mane. Dibê ku zaro-yên me ji vê dêranîyê bifilitin, hîn bibin, bixwînin ku sibê robikêrî welatê xwe bin Ji vê bûnê Yekîti ewê bi pirsên xwendina keç û xortêñ Kurd re bi nêzikî bili(mijûl)

- PIRSEÑ CIVAKI (sosyal) ÊN KARKERAN: ji-ber zman nezanî heta niha gelek karxwe(patron), carna bi arîkarî ya tercimanêñ xulamok, maf û heqêñ karkeran xwarine. Ji niha bisûnda ewê Yekîti bi arîkarîya xwendekarêñ Kurdêñ Fransayê bi van pirsan bili bibe,



# FRANSAYÊ KOMELEKÎ DANÎN

bî sendîkayê pêşverû yêñ fransiz re danûstan çêke, mafêñ qanûnîyêñ karkeran biparêze; di pirsêñ mal û kardîtin, hwd. de jî a rîkarîya wan bike.

- PÊŞWEBIRINA HÎNBÛN Ü ZANINÊ:** Îro ro xurtahîya mil tenê pere nake; serê her tiştî zanîn e. Çinêñ serdest nehiştine ku karkeren Kurd bixwînin; ew ji hisiyarbûna wan ditirsin. Ewê Yekîti li ser zmanê kurdî, li ser dîroka Kurdistanê, li ser dîroka tevgera karkeran li Cîhanê, li ser xebata sendîkayî, li ser dîroka şoreşen karkeran mijûlahîyan pêk bîne, pê zanebûn û serwextîya endamên xwe pêş ve bibe.

DANNASKIRINA PIRSA KURD LI DERVEYÎ WE LÊT: Ewê karkeren Kurd bi şandina telegraman bi derxistin û belavkirina danezan û belavokan, bi meş û raberîyan rewşa gelê Kurd li derva bidîn naskirin. Di vê rê de danûstanan bi sendîka û partîyêñ pêşverûyêñ Fransiz re ferz e.

YEKİTİ KOMELEKÎ DEMOKRATİK E. Dergehîn wê, faşîst û paşverûne tê de, ji hemî karkeren Kurdistanê re-bîrûbawerî yêñ wan, dilxwazîyêñ wan ên si yasî çi dîbin bila bîbin-vekirîne. Dibê ku ew nekeve dûva besöka (fraksîyon) an komikekî, tê de her karkerdi karibe bi serbestî, û li gora demokrasîya karkeran dîtinêñ xwe bêje, biparêze.

- Axa, beg, şêx, pîr û dede di alîkî de belengazên Kurd dişêlinin, di alîyê din de milê wan di yêñ bûrjûwa û sermayedarêñ Ereb, Tirk û Ecem da ne, ji wan re xulamtiyê dikin. Ew xwînmijîn gelê Kurd in, hevkareñ dijmin in. Bi gur re mî dixwin, bi xwedî re jî şînê dikin. Loma şerê karker û cotkarêñ Kurd jibo azadîya xebatkarêñ li dijî talan, şîlandin û kedxurîyê, jibo ku herkes bi keda xwe ya helal bijî, jibo avakirina Kurdistanâ sosyalîst şerekî li dijî van te beqeyen kevnare û kevneperesten Kurd e jî.

- Xebatkarêñ Kurd ne nijadperest û nasyonalîst in. Ew enternasyonalîst in. Ew xebatkarêñ Tirk, Ereb, Ecem û yêñ welatêñ din jî ji xwe re destbrak dizanî; tucar neyartîya wan nakin, biserde, ku ji wan bê, ewê arîkarî ya wan jî bikin û bîserfirazîyêñ wan dilşâ bibin.
- Lê bratî tiştîk e, xulamti û dûajoyî tiştîk din e. Divê ku bra qedrê hevûdin zanibin ji serxwebûna hevûdin re hirmetkar bin, têki lî karê hev û din mebin. Loma xebatkarêñ Kurd bawer in ku çawa xebatkarêñ VietNam û Cezayîrê jibo rizgarî ya welatê xwe ji koledarîya fransizî, li hêviya serfirazîya sos-

## çend dîtin û bawerî

- Çi Sunnî, çi Alewî, çi Yezîdî, çi Mesîhî hemî karkeren Kurd bîrayêñ hev in; doza wan yek e; qedera wan bi hev ve girêdayî ye. Li hemberî teşebisên çîn (sinif) û qorêñ serdesten ku dixwazin ji bo domdarîya serdestî ya xwe karkeran li gorâ mezheb û dînan veqetînin, perçe bikin, divê ku karker ya xwe têxin yek, destbrakîya xwe xurt û têkûz bikin, ji van leyistikian re nebin halet.

- Edîlandin û qenc-tirkirina hal û rewşa karker û gundîyêñ belengazên Kurdistanâ bindest bi rizgarîya, Kurdistanê ve bi nêzîkî girêdayî ye. Divê ku karker bi cotar û gundîyêñ belengaz, bi xwendekar û bîrewerêñ welatparêz re yekbin, milletê Kurd ji bindestî û koletîyê xelas kin, Kurdistanâ xebatkaran, ne ya axa û began, Kurdistanekî sosyalîst ava kin.

# Şoreşa - xelkê

Dumathika Rupela 3a

yalîzmê li Fransa ne-sekinîn, xwe bi xurtahîya milên xwe azad kirin, ewê Kurdistan jî bi destê karker û cotkarêن Kurd, û tenê bi destê wan, bê rizgar kirin.

Divê ku wekî xebat-karên milletên din, xebatkarêن Kurdistanê jî komele û teşkîla-tênen xwe yên arizî û biserêxwe deynin. Û jibo avakirina Kurdistana sosyalîst bixebeitin.

## Bersiva Kaddafi

*Me têla we ya spastyê stend. Tevgera me ya jibo mille-tê Kurd bi bingehê şoreşa me ya 1 ê ilo nê derheqa mafê mirrov û milletan ê jiyanê ve ahengdar e. Milletê Kurdê bra û misilman divê weka hemî milleten cihanê di azadtyê de bijt. Silavên me yên dil-soztirtn.*

Piştî sazbûna xwe Yekîti hema dest bi xebatê kir. Di alîkî de digel xwendekaran bi minasebeta çûyina Ecevit a Lîbyayê ji Kaddafi re têl kişand û bala wî li bindestî û koletîya ku 10 milyon Kurdên Tirkîyê têde ne (binêre bersiva Kaddafi) kişand, di alîyê din de ji Kurt Waldheim re têlekî di rîj liser rewşa res û xeraba ku Kurdên Iraqê têde ne şand, têkîlîya Neteweyêن Yekbûyî li hemberî sîyaseta hov û mîrkuja faşîstên Bexdayê xwast.

Azadî, bi dilgermî-yekî xurt sazbûna Yekîtiya Xebatkarên Kurdistanê li Fransa pîroz dike, jê re di xebata wê ya giranbiha de serfirazî dixwaze

2° USA bi antî-kommunîzma mela û ayatu lahan bawer e. Heke "hikûmeta İslâmî" di destpêkê de dijî-amerîkanî be jî ewê berebere hewcedarîyên aborî û teknolojîk û xofa kommunîzmê wan jinûve nêzikî Dewletên Yekbûyî bike. Himin parastina şah ïndî ne mimkin e, qenebe pêşiyê li guhêrandineke "mutedîl" negirin an na teqandinê civakîyên kûrtir, çûna berbi kommunîzmê mimkin dikan.

Pêvajoya şoreşgerî gihîştîye fet-lanekekî. Di navbeyna hêzên ku duh li hemberî Şah bi yekîti şer kiribûn lê xwedîyê bîr û bawerîyên pir cihê bûn ewê liser xêz û armancêن şoreşê cihêbûn, vegetandin, xirecir peyda bibin. Ev nayêrevîn e. Bi milyonan Kurd, marksîst û şoreşgerên Iranî, duh ji bo mebin armancên Savak û ordîyê di bin navê Xumeynî meşîyan jibo ketina Şah. İro ewê, xwezayane, bixwazin bernâme û armancên xwe bicîhbînin.

Di van hoyan de sê rê mimkin in;

a) Baskê rastê Xumeynîstan tevî "Cepha Millî" dest datînin ser şoreşa xelkê, piştî kuştin û guhêrandina çend general û karbîdest dibêjin ku şoreş xelas bû, her kes here li mala xwe rûnê, Komara xwe ya İslâmî, bê guhêrandinê civakîyên hîmî ûlan dikan. Hingê ewê bivê-nevê di hindur de xwê bispêrin burokrasîya kevna dema şah û li derva xwe bi sistema kapîtalîst ve girêdin. Ew çax kapîtalîzma Iranî bi rûçikekî "demokratiktir" (jiber hebûna Komar û helbijarti-nan) domî hikma xwe bike. Guhêrandin tenê di warê siyasi de dimîne, nabe civakî.

b) Baskê çep, wekhevîxwaz û antî-emperyalîstê Xumeynîstan bi hêzên çep û yên gelên Kurd, Azerî, Belûc û Ereb re hevalbendî çêdîkin; mafêni siyasi û çandî didin hemî xelkên Iranê, xwe dispêrin 100 000 bîrewer û xwendekarên çepênu ku ji destê zorkariya şah revîyabûn derva, reformen civakîyên hîmî bicîhtînin û Iranpe ji dûvîka emperyalîzmê xelas dikan, dixin ser riya gesbûnîye ke ne-kapîtalîst.

c) Şerê navbeyna çep û rastan an navbeyna Tehranê û tevgera rizgarîxwaza Kurdistanê, ordîyê ji "gunehê berê" dişo, wê xurt û birûmet dike. Hingê jibo "rawestandi na şerê brakuj" darbeyekî eskerîyê çêdibe û rejîmeka wek ya Baasa Iraqê bicîhdibe.

Hêzên çep û yên gelên bindest heke ji jîrahîya xwe ya siyasi û bi şerkarîya xwe dikaribin xwe li bilindahîya rewşa dîrokî nîşan din, ewê dikaribin di van roj û hefteyên kifşker de hindaveke (îstîqameteke) pêşverû bidin ber tevgera xelkê. İro ku xelk bi xurtahîya xwe hisîyaye û serwext e, çend gav pêşve avêtin, çend kelên serdestîya bûr jûwazîyê hilweşandin mimkin e. ♦♦♦

# \* \* \* BÎRANÎN \* \* \*



**R**oja 30.1.1979 di salonên Xwendegeha Neteweytya Zmanêن Rohelatîyêñ Jîndar (ENCLO) a Zantîngeha Sorbonê civînekt çêbû jibo bîr-anîna Kamûran A. Bedirxan. Sermîyanê xwendegehê, profesor û xwendekar, nas û dostên zanevê Kurdê navdar, Kurdêñ Parisê hemt li wêderê, jîbo silava dawîn gihtştibûn hev. Bi dorê Prof. L. BAZIN, Mme De WANGEN û General P. RONDOT jiyanâ K. Bedirxan, xebata wî ya çandî, zanistî û siyast bibîrânîn. Civîn bi temâsekirina dîapoziştîvên li ser Kurdistanê ku J. BERTOLINO pêşkes dikir, qedîya. Em di vê hejmarê de zane û welatparezê ji nav me çûyîf bi weşandina çend ji çarînêñ Omar XEYAM ku ewt ji farist wegerandibû, bibîr tînin.

## ÇARÎNÊN XEYAM

i natin û çûna me kar ci ye ?  
Berê hêvîya jîna me li ku ye ?  
Di çerxa canî de çend mîrovêñ pak  
Şewitîn û ax bûn ma dû li ku ye.

**R**ûroj rabe û were jîbo xatirê me  
Hel ke mişkilekê wek daxwaza dilê me  
Şerbikeke şerabê bîne de em vexwin  
Ji pêş ko şerbikan çêkin ji axa me.

**L**êva avê digel piyan şerab û meyger  
Bihuşata min û te ye delal e ew der  
Dest ji gotina bihuşt û dojehê bişo  
Ma kî çû dojehê û hat bihuşt zer

**D**uh ber meyxaneyê re derbaz bûm bê his û mest  
Û min pîrek serxwes dît misîn bi dest  
Min ji pîr re go ma tu ji Xwedê şerm nakî ho  
Go kerem ji Xwedê ye de here şerabê vexwe lo

**I**nê de berê dara rastîya kûr ne giha  
Lew di wê rê de hemî ne rînezan  
Her kesî destê xwe bi çiqilekî sist girtiye  
Îro wek sibê wek roja pêşîn e bizan

**E**v dînê ko çend roj bû pêgehê me  
Ji xemê pêve hîç ne bû destgehê me  
Wey li me pirseke me jî hel ne bû.  
Çûn û hezar bêrî man di cergê me

**H**eyf strana ciwanî çikîyaye  
Ev bihara şahîyê êdî nemaye  
Ew çûka cejna ko navê wê ciwanî bû  
Hawar çawan hat û kêngê firîyaye.

# ZMAN

## Ferhengok

aborî: (t) ekonomi; (f) économie  
 afirandin: (t) yaratmak; (f) créer  
 alîgir: (t) taraftar; (f) partisan  
 ango: (t) yani; (f) c'est à dire  
 arizî: (t) özel; (f) privé, particu-  
 lier  
 aşîti: (t) barış; (f) paix  
 averû: (t) kavram; (f) conception  
 azîn: (t) yön tem; (f) méthode  
 bazirganî: (t) ticaret; (f) commer-  
 ce  
 berbaz: (t) astsubay; (f) sous-of-  
 ficer  
 berxwedan: (t) direniş; (f) résis-  
 tance  
 boran: (t) bunalım; (f) crise  
 civak: (t) top lum; (f) société  
 çap: (t) basim; (f) presse  
 çapxane: (t) matbaa; (f) imprime-  
 rie  
 çîn: (t) sınıf; (f) classe  
 dane: (t) veri; (f) donnée  
 danûstan: (t) mübadele;  
 (f) échange  
 daxuyanî: (t) manifesto; (f) mani-  
 feste  
 dema me: (t) milad; (f) notre ère  
 dewsok: (t) yedek; (f) accessoire  
 dijaneyî: (t) tersine; (f) contrai-  
 rement  
 dirav: (t) para; (f) argent, mon-  
 naie  
 diraw: (t) ücret; (f) salaire  
 dirûvdayî: (t) benzer, (f) ana-  
 logue, similaire  
 diviyahî: (t) zorunluluk, gereksinim; (f) nécessité  
 dîrok: (t) tarih; (f) histoire  
 dojeh: (t) cehennem; (f) enfer  
 ebûr: (t) geçim; (f) subsistance  
 ebûr kirin: (t) geçinmek; (f) sub-  
 sistir  
 enî: (t) cephe; (f) front  
 frotîşk: (t) eşya; (f) marchandise  
 gef: (t) tehdit; (f) menace  
 gefandin: (t) tehdit etmek; (f) me-  
 nacer  
 gerdûn: (t) evren; (f) univers  
 geremol: (t) kargasalik; (f) désor-  
 dre, confusion

girse: (t) kitle; (f) masse  
 girseyî: (t) kitle sel; (f) massif  
 hemberî: (t) rekabet; (f) concur-  
 rence  
 herikan: (t) akım; (f) courant  
 hêsan: (t) kolay; (f) facile  
 hêsandin: (t) kolaylaştırmak;  
 (f) favoriser, faciliter  
 hilberinî: (t) türetim; (f) produc-  
 tion  
 hisandın: (t) muhakeme etmek ;  
 (f) raisonner  
 hoy: (t) koşul; (f) condition  
 hoyändin: (t) şartlandırmak; (f)  
 conditionner  
 hwd. (her wekî din): (t) vs. ; (f)  
 etc.




jibo zaro  
 yan bi  
 zmanê kur  
 dî li Swê  
 dê derke-  
 tiye. Lê  
 hun dikar-  
 in ji me  
 bixwazin.



jêza: (t) köken; (f) origine  
 jîndar: (t) canlı; (f) vivant, e  
 karîn: (t) iktidar; (f) pouvoir  
 kevneşopî: (t) geleneksel; (f) tra-  
 ditionnel  
 kirû: (t) olgu; (f) fait  
 mengî: (t) ideal; (f) idéal  
 mengîwer: (t) idealist; (f) idéa-  
 liste  
 mirovhiz: (t) insancıl; (f) huma-  
 niste  
 mînak: (t) örnek; (f) exemple  
 navgîn: (t) araç; (f) moyen  
 nîşe: (t) not; (f) note  
 nûjen: (t) modern; (f) moderne  
 nvîsar: (t) yazı; (f) écrit, texte  
 nvîskar: (t) yazar; (f) écrivain

padarserî: (t) paderşahi; (f) pat-  
 riarcat  
 peywendî: (t) ilişki; (f) relation,  
 rapport  
 peyweng: (t) alet, gereç; (f) ins-  
 trument  
 pêlgerîn: (t) dalgalanma; (f) fluc-  
 tuation  
 pêşajo: (t) öncü; (f) avant-garde  
 pêvajo: (t) süreç; (f) processus  
 pirtûk: (t) kitap; (f) livre  
 pîşewer: (t) zanaatkar; (f) artisan  
 ramandin: (t) düşünmek; (f) penser  
 rasdîdemî: (t) düzenli; (f) régulier  
 rojnamevan: (t) gazeteci  
 lier  
 (f) journaliste  
 serbaz: (t) subay; (f) officier  
 şehrezayî: (t) uygarlık; (f) civilisation  
 şîro vekirin: (t) yorumlamak; (f)  
 commenter  
 teva: (t) biçim; (f) forme  
 têgihîştin: (t) anlam; (f) sens, ac-  
 ception  
 tixûb: (t) sınır; (f) frontière

vedor: (t) peryod; (f) période  
 weş: (t) an; (f) moment  
 weşî: (t) bir anlık; (f) momentané  
 yekdîde: (t) monoton; (f) monotone  
 zanîngeh: (t) üniversite; (f) uni-  
 versité



HINDAV: (t) yön; (f) sens, direc-  
 tion  
 BAKÛR: (t) kuzey; (f) nord  
 NÎVRO: (t) güney; (f) sud, midi  
 ROJAVA: (t) batı; (f) ouest, occi-  
 dent  
 ROJHELAT: (t) doğu; (f) est, ori-  
 ent

## Elfabe

Ji salên 1930 an  
 bivirde zmanê Kurdî bi  
 tîpêñ (herfîn) latînî  
 tê. nvîsandin. Elfabeya  
 latînî xweş li zmanê me  
 tê û ewê bêguman bibe  
 ya hemî Kurdan. Lê niha  
 jiber sedemêñ cihêreng  
 piranîya Kurdêñ Iran û  
 Iraqê tîpêñ erebî, yêñ  
 Sovyetîstanê jî tîpêñ  
 rûsî bikartînin. Jibo a-  
 gahdariya xwendevanan  
 va ne ev her sê elfabe.

Latîni Rûst Erebî		Latînî Rûst Erebî	
A	أ	ا	ا
ب	ب	ب	ب
ج	ج	ج	ج
د	د، ض	د	ر
هـ	هـ، هـ، عـ	هـ	س، سـ، شـ
فـ	فـ	فـ	تـ، طـ
گـ	گـ	گـ	وـ، وـ
حـ	حـ	حـ	شـ
لـ	لـ، حـ، جـ، يـ	لـ	تـ، ئـ
مـ	مـ	مـ	وـ، وـ، وـ
N	نـ	نـ	نـ
O	وـ	وـ	وـ
P	پـ	پـ	پـ
Q	قـ	قـ	قـ
R	رـ	رـ	رـ
S	سـ	سـ	سـ
T	تـ	تـ	تـ
U	عـ	عـ	عـ
Y	يـ	يـ	يـ
V	بـ	بـ	بـ
W	وـ	وـ	وـ
X	خـ	خـ	خـ
Z	زـ	زـ	زـ

KURDÎ BIXWÎNE, HÎN BİBE, HÎN BIKE!..

# Deng û Alan

## Çapa Kurdi

MUAMMER KADDAFI

"Kurd milletekî ne ;ev millet hâtiye perçekirin.Şerê milletê Kurd ji bo azadîya xwe li dijî dewletên Rojhe lata Navîn şerekî rast e." Di axaftina xwe ya 18 çile 1979 a jibo Radio-France Internationale serekdewletê Libyayê cardin dike ku Kurd, wekî hemî xelkên din, divê bibin xwedîyê " hemî heqên xwe ". Ev danezan bala hawirêni siyasîyên cîhanê kişand û nexwesî û nerazîbûn da peyda kirin li serbaja - rîn dewletên ku Kurdistanê li hev parîkirine.

### PARTİYA KOMMUNİSTA FRANSAYÊ

Partîya Kommunîsta Fransayê, di danezaneke 31.1.1979 ji nûve bala demokrat û pêşverûya li ser zordestî û stema ku hikûmeta Baasî li Kurd û Komunîstên Iraqî dike dikşîne. Li gorâ vê danezanê di van demên dawîn de zorkerî û perçiqandin li Kurdistanê bêtir bûye, 3 endamên komîtê navçeya Partiya Kommunîsta Iraqê Istafan, Matař û Abdel Amir Abbas hatine kûstîn, avahîyen Partiyê hatine şewitandin.

### NEW YORK TIMES MAGAZINE

Rojnameya Amerîkanîya navdar di hejmara xwe ya 4.2.1979 da roportajekî dirêj ( 6 rûpel ) ê fîlmçêkerê emerîkanî Elia KAZAN li ser Yilmaz Güney derket. Tê de xeynî şertê jiyanê li Girtîgeha Toptaşı ya Stembolê, Kazan ji Güney hin pîrsên siyasi jî dipirse. Yilmaz Güney dîsa bi mîranî pêştgi riya şerê gelê Kurd dike û mafêñ wî diparêze û dide bîr ku Ankara di alîkî de jibo mafêñ kulmekî Tirkan Qibrisê îşxal dike, di alîyê din de ji milîyonên Kurdên Tirkîyê re tu mafekî ( heqekî ) nas nake.

### ROUGE

Rojnama kommunîsta şoreşgera fransiz di hejmara xwe ya 27.1.1979 an de bendekî dirêj li ser şerê Kurdên Iranê derxist û tê da cîgehê berbûçavê vî şerî di boran û ketina sazûmana Sah de kifş kir.

### 24 HEURES

Rojnama swîsî ya bi zmanê fransi zî di hejmara xwe ya 27-28.1.1979 a de bendekî Dr. Nureddîn Zaza li ser Kurdên Tirkîyê çap kir.

★ Bi zmanê Kurdi û tî pêñ latînî bilî Azadî yê tu kovar dernakevin. Va ne navêñ yêñ ku bi tîpêñ din dertê.

★ Riya Teze, ji sala 1930 a bivirde li Erîvanê di heftê de dû car derdikeve. 4 rûpel û Organa PK a Ermenîstanê ye.

★ Kurdistan, organa PDK a Îranê ji mehê carekî bi tîpêñ erebî dertê. 4 r.(çapa farsi jî dertê)

★ Bîra Nû, organa Partîya Kommunîsta Iraqê, bi tîpêñ erebî dertê. Kovareñ ku bi du zmanan dertê

★ Rizgarî, bi kurdî-tirkî li Tirkîyê dertê. Hejmara pêşîn di a dara 1976 a de derketîye. Heta niha 6 hejmar çap bûne. Her hejmarekî 130-140 rûpel.

★ Roja Welat, bi kurdî-tirkî li Tirkîyê dertê. Heta niha 12 hejmar çap bûne. Her hejmarekî 16 rûpel e.

★ Kovara Özgürlik Yolu(Riya Azadî)ku ji hezirana 1975 a bivirde ji mehê carekî dertê, bi kurdî bendant li ser zman û wêjeyê çap dike.

★ Devrimci Demokratik Gençlik Dergisi, bi tirkî-kurdî li Tirkîyê dertê. Heta niha 11 hejmar çap bûne.

★ Roja Nû, bi tirkî-kurdî li Swêdê dertê. Organa Komela Karke-rêñ Kurd li Swêdê ye. Heta niha 4 hejmar derketine û 4 rûpel e.

# \* Stran û Leylan \*\*

AZADI, jibo qens nasîna mûzî-kiya kurdî sêlik (plak) û ka setên biqalîte bîdest dixe, dadigre û difroşê. Ji niha ve hun dikarin vêlî li jêrê binay kirî ji me bixwazin. Her kase-tekî 60 deqîqe dom dike û bi 5 Dollar (10 DM), Sêlika 33 ger bi 7 Dollar (14 DM) e.



## Kaset

- 1▪ Meqamên kevn bi orkes tra nûjen ((lêdixe Orkestra Gelerîya Kurdistanê))
- 2▪ Kulamên Dilan - 1-
- 3▪ Kulamên Dilan - 2-
- 4▪ Kulamên Siyaran
- 5▪ Bilûr, Fîq (dûdûk), Pîyano
- 6▪ Def, Zirne û Fîq
- 7▪ Beyt, Qesîde, Helbest
- 8▪ Aram
- 9▪ Kulamên Kurmancî û Soranî (bê musîkî)
- 10▪ Kulamên Govendê (bê musîkî)

## azadî

### ARAM




Stran û leyланен  
KURDÎ  
Kurdish Songs & Melodies

### Sêlik;Kulamên Dilan

Rûyê A: 1.Dêresorê Piçûkê, 2. He  
kîmo, 3.Yar Gulê, 4.Eyşanê, 5.Aî  
mast, 6.Lê lê dayikê  
Rûyê B: 1.Cirît, 2.Gulîzer, 3.Lê  
Pîrê, 4.Vê Yarkujê, 5.Apo, 6.We-  
latê me Kurdistan e.

Musique populaire  
du  
**KURDISTAN**

## KURDISTAN



## last colony

MELINGEHA DAWIN  
FREEDOM FOR THE KURDISH PEOPLE !

AZADI JIRO GELE KURDE Capadoc azadi

Xarîta Kurdistanê, 40x60, 3DM.



# \* Stran û Leylan \*\*\*

KEWÊD GOZEL

CEMILA CELIL

Vivace

Em ye - kin, ze - rî ye - kin,  
Ke . wêd go - zel, ke - wêd go . zel, nar, nar.  
Em yekin, zerî yekin,  
Kewêd gozel, kewêd gozel, nar, nar.  
Baix û bostan ç'îç'ekin,  
Kewêd gozel, kewêd gozel, nar, nar.

Em cotin, zerî cotin,  
Kewêd gozel, kewêd gozel, nar, nar.

Baix û bostan kewotkin,  
Kewêd gozel, kewêd gozel, nar, nar.

## Lenîn dibêje

{ ÇAWA MIROVAHÎ NIKARE BIGIHÊ WINDABÔNA SINIFAN(CİNAN) BEY  
GEHİNEKA DERBASİ YA DİKTATORIYA SINİFA BINDEST,WISA Jİ EW  
NIKARE BIGIHÊ TEVHEVİYA NAYEREVİNA(MIQEDERA) NETEWEYAN TA  
KU EW DEMA DERBASOKA RIZGARIYA TEMAMÎ YA HEMÎ NETEWEYÊN  
BINDEST NEJÎ,TA KU NETEWEYÊN BINDEST AZADIYA XWE YA CIHÊ-  
BÛN Ô VEQETANDINÊ BIDEST NEXIN. }

Oeuvres (Afirandin), 22, p. 159



**azadî**  
KOVARA MARKSİSTA KURDI

KURDISTANA AZA, YEKBÜYÎ, SOSYALİST !

Jibo nêzîkbûyîna hêz, bêsok û komikên şoresger û welatparêzên Kurdistanê dixebite.

Bi arîkariya komekî Xebatkar û Xwendakarên Kurd derdikeve.Bi tu partî û hevdesaziyê tu perçeyekî Kurdistanê ve negirêdayî ye.

Berpirsiyarê gîstî :	K E N D A L
Nîsekarî :	E V D O
Berpirsiyarê malhebûnê:	H.KARACA
Foto-Maket :	J.BERTOLINO
Çap :	İsmet-Misto-Rauf

NAVNIŞAN (adres): KOVARA AZADI

B.P.378 75625 PARIS CEDEX 13 France

•DIRAV(pere)li ser navnişana AZADI  
CCP n° 23 37 449 L Paris/ France